

# ZARGOTINA KURDA





INSTITUT FÜR KURDOLOGIE - WIEN

---

ORDIKHANE JALIL  
JALILE JALIL

**KURDISCHE  
ORAL-LITERATUR**

**EPEN**  
**(EPOS, ROMAN, ERZÄHLUNG)**  
*In Kurmandschi*

**2**

WIEN 2014



ÎNSTÎTÛTA KURDZANÎYÊ - WIEN

---

ORDÎXANÊ CELÎL  
CELÎLÊ CELÎL

## ZARGOTINA KURDA

ÊPÎKA  
(BEYT, DASTAN, ROMAN)  
*Kurmancî*

2

WIEN 2014

*Pirtûk bi saya alikariya hêjayan Îbrahîm û Aynûr Gurbuzan çap dibe.*

Çapkir: Înstîtûta Kurdzanîyê – Wien

Herausgeber: Institut für Kurdologie – Wien

Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl

ZARGOTINA KURDA

Êpîka (Beyt, dastan, roman)

Benda 2

686 rû + 16 rû ill

Wien – 2014

Notanivîs: Cemîla Celîl

Karê ser kompyûtêrê: Cemalê Celîl (Alîonîs), Lusîka Gêrman û Nara Celîl

Mîzanpaj: Cemalê Celîl (Alîonîs)

Nîgara (Grafîk) ser rûê yekê – Kurd serokê eşîrê (Lê Tour du Monde; Paris 1875)

Grafîka rûê dûda û sisya: Malwa (Omar Hamdî)

Ordikhane Jalil, Jalile Jalil

KURDISCHE ORAL-LITERATUR

Epen (Epos, Roman, Erzählung)

Band 2

686 S. + 16 S. Ill

Wien – 2014

Noten: Jamila Jalil

© Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Cemîla Celîl, Zîna Celîl

ISBN 3 – 902185 – 51 – 1



## Navarok

Geleitwort (Prof. Dr. Heiner Eichner) .....	7
Pêşgotin .....	9
1 Mem û Zîn (şaxa 1) .....	23
2 Memê û Zînê (şaxa 2) .....	52
3 Mem û Zîn (şaxa 3) .....	72
4 Mem û Zînê (şaxa 4) .....	99
5 Sîyad Ah'med (şaxa 1) .....	140
6 Sîyabendê Silîvî û Xecê (şaxa 2) .....	169
7 Sîabend, Xecazerîn (şaxa 3) .....	199
8 Sîabend, Xecêzerê (şaxa 4) .....	207
9 Strana Xecê û Sîabend (şaxa 1) .....	211
10 Strana Syabend û Xecê (şaxa 2) .....	215
11 Fatima Salih-aşa û Meh'medê lawê mîrê Hoska .....	217
12 Strana du bira Zalim-begê û Nasir-begê .....	228
13 E'ya İbê (şaxa 1) .....	247
14 Bozê K'emala (şaxa 2) .....	252
15 Bozanê lawê pîrê (şaxa 3) .....	270
16 E'ya Bîbê (şaxa 4) .....	275
17 Cebelîyê mîrê Hek'êrî û Binefşa Narîn (şaxa 1) .....	281
18 Binefşa Narîn (şaxa 2) .....	308
19 Binefşa Narîn (şaxa 3) .....	325
20 Zembîlfiroş (şaxa 1) .....	340
21 Zembîlfiroş (şaxa 2) .....	346
22 Zembîlfiroş (şaxa 3) .....	351
23 Zembîlfiroş (şaxa 4) .....	355
24 Zembîlfiroş (şaxa 5) .....	359
25 Zembîlfiroş (şaxa 6) .....	363
26 Zembîlfiroş (şaxa 7) .....	380
27 Zembîlfiroş (şaxa 8) .....	385
28 Leyl û Mecrûm (şaxa 1) .....	392
29 Leyl û Mecrûm (şaxa 2) .....	398
30 Leyl û Mecrûm (şaxa 3) .....	415
31 Sêva H'acıya (şaxa 1) .....	421
32 Sêva H'ecê (şaxa 2) .....	441
33 Sêva H'acê (şaxa 3) .....	448
34 Sêva H'aco (şaxa 4) .....	452
35 Sêva Hacê (şaxa 5) .....	455

36 Qumrî-xatwîn .....	460
37 H'emdîn û Şemdîn .....	477
38 Xelîl-bego (şaxa 1) .....	498
39 Xelîl-bego (şaxa 2) .....	510
40 Xelîl-bego (şaxa 3) .....	522
41 Xelîl-bego (şaxa 4) .....	523
42 Xelîl-beg (şaxa 5) .....	525
43 H'esenê Alikî .....	528
44 Kejê, Salo (şaxa 1) .....	542
45 Salihê lawê mîrê berêz (şaxa 2) .....	554
46 Meleknaz .....	564
47 Ūsibê Nebîya .....	574
48 Hewêlî Gewrê (şaxa 1) .....	581
49 Hewêlî Gewrê (şaxa 2) .....	586
Notanivîsar (Cemîla Celîl) .....	590
1. Memê û Zînê .....	590
2. Memê û Zînê .....	591
3. Memê û Zînê .....	592
4. Sîyabend û Xecê .....	593
5. Sîyabend û Xecê .....	593
6. Sîyabend û Xecê .....	594
7. Fatîma Salih-aşa û Meh'medê lawê mîrê Hoska .....	595
8. Binefşa Narîn .....	597
9. Zembîlfiroş .....	598
10. Sêva Haco .....	599
11. Xelîl-bego .....	600
12. Xelîl-bego .....	600
13. Ūsib û Zelîxê .....	601
Nivîsarnasîya nota:.....	602

#### Paşkok

Paşkoka 1 <i>Mem û Zîn</i> .....	603
Paşkoka 2 <i>Berhevdana "Mem û Zîn"-a Ahmedê Xanî û şaxên zargotinê</i> .....	624
Paşkoka 3 <i>Mamo und Sine (bi almanî)</i> .....	636
Paşkoka 4 <i>Sîahmed û Şemsî-xatun</i> .....	644
Paşkoka 5 <i>Sîabend, Xecazerîn</i> .....	646
Nivîsarnasî .....	658
Kurtejiyana zarbeja .....	671
Ferhenga p'eyvên bîyanî û kêmnas .....	679
Navrêzka nîgara .....	686
Fotoalbom .....	687

---

---

## Geleitwort

Mit diesem Band präsentiert Professor *Jalile Jalil* den zweiten Teil einer auf 25 Bände konzipierten monumentalen Ausgabe der Sammlung oraler Folklore im kurdischen Hauptdialekt Kurmanji, die er gemeinsam mit seinem älteren Bruder *Ordikhan* (+) im Laufe von sechzigjähriger Feldforschung in weit voneinander entfernten Gebieten Kurdistans zusammengebracht hat. Aus dem die Gattungen Epos, Lied, Roman, Erzählung umfassenden Material ist hier im zweiten Band wiederum Episches ausgewählt, wie schon beim ersten Band der Serie. Weiter wird dem Epos auch noch der nachfolgende dritte Band gewidmet sein. Die Abfolge der drei Bände ist nicht durch inhaltliche oder qualitative Kriterien bedingt – alle drei Bände haben als gleichwertig zu gelten. Die zugehörigen Originalaufnahmen in Form einer umfangreichen Kollektion von Tonbändern werden in der nach dem Vater *Jasme Jalil* benannten Bibliothek des *Instituts für Kurdologie* (Wien) aufbewahrt. Die in den epischen Texten behandelten Themen sind traditionell und seit Jahrhunderten weit unter den Kurden verbreitet. Auch zweisprachige Sänger armenischer oder neuwestaramäischer ("assyrischer") Herkunft sind vertreten.

Manche Stücke sind bereits in früheren Publikationen der Brüder Jalil in kyrillischer oder arabischer Schrift publiziert worden. Die jetzige Ausgabe ist durchweg in lateinischer Schrift nach dem Umschriftsystem von *Celadêt Bedir Khan* gehalten, doch mit genauer Berücksichtigung aller phonematischen Distinktionen des Kurmanji. Zu diesem Zweck werden über den Standard von *Bedir Khan* hinausgehend diakritisierte Zusatzbuchstaben eingeführt, die aus der Alphabettabelle am Ende des Vorworts (p. 22) zu ersehen sind. Bedingt durch den massiven Umfang der Sammlung wird auf die Beigabe von Übersetzungen verzichtet.

Der hier vorliegende zweite Band ist in 49 Abschnitte gegliedert. Ihre Anordnung ist thematisch. Alle zu einem Thema aufgenommenen Varianten werden zusammengeführt, unabhängig vom jeweiligen Repertoire der Sänger und ohne Rücksichtnahme auf ihre weitgestreute geographische Herkunft, oder auch auf die Qualität. Auf diese Weise ist die bequeme Vergleichbarkeit gewährleistet. Anhänge bringen den Wortlaut einiger zugehöriger Lieder zusammen mit Melodien in musikalischer Notenschrift von *Jamila Jalil*, außerdem ein Verzeichnis der Quellen mit Bibliographie, eine Liste der Aöden (Sänger) mit biographischen Angaben,

einen lexikalischen Index schwieriger Wörter; man sehe auch den Nachweis der im Text verstreuten Photographien von Aöden und an der Aufnahme beteiligten Forschern. Ein fünfteiliger Anhang betrifft *Mêm û Zîn* (Teil 3 ältere Aufnahme von Prym und Socin, auf Deutsch, p. 636 ff.) und *Siyahmed û Şemsî-xatun* (Aufnahme von Jaba).

Der folkloristische Reigen von Liebes- und Heldendichtung, ohne rote Linie zwischen den beiden, entweder ganz in Versstrophen, oder auch in einer Mischung aus Prosa und Vers gehalten, wird durch das Thema der tragischen Liebe von *Mêm und Zîn* eröffnet (in vier unterschiedlichen Versionen). Durch das gleichnamige Werk des berühmten Dichters *Ehmedê Xanî* (1651-1707), gleichsam im Rang eines "Nationalepos", ist dieser Stoff ja bereits zum festen Bestandteil auch der geschriebenen kurdischen Literatur geworden. Hier stellt sich die Frage nach der Wechselwirkung zwischen mündlicher und schriftlicher Literatur (s. Jalil im Anhang II p. 624 ff.). Auch der bekannte kurdische Erzählstoff von *Siyabend û Xecê*, einer ebenfalls symbolhaften Liebestragödie, ist vertreten.

Die reiche orale Überlieferung ist eine wichtige Grundlage für das soziale Leben, das Zusammengehörigkeitsgefühl und die Identität der großen, auf mehrere Staaten aufgeteilten Sprachgemeinschaft. Sie gehört aber auch zum unverbrüchlichen Bestand der vorderasiatischen und europäischen Kultur- und Geistesgeschichte. Dass diese "Literatur in oraler Form" von den Brüdern Jalil in den Jahrzehnten aufgenommen worden ist, als sie noch in ungebrochener Tradition und vollster Blüte gestanden hat, ist ein Glücksfall. Umso wichtiger erscheint es, dass sie nun der Wissenschaft und der Allgemeinheit im Druck zugänglich gemacht wird. Als Sprachwissenschaftler begrüße ich zudem noch besonders, dass uns dadurch auch ein umfangreiches Corpus des Kurmanji an die Hand gegeben ist.

**Prof. Dr. Heiner Eichner**



---

---

## Pêşgotin

Ev benda zargotina kurda ya ber dest li bin hijmara 2-a, her wek benda pêşin, ser janra (malbata) zargotinêye êpîk-dastaniye. Berhemên êpîkî yên tomarkirî me para vekirine ser sê benda. Eva ji wan hersêka benda dudane.

Paravekirin ser hersê benda tu şertên navarokîva girêdayî nîne. Berhemên, ku di benda dudada cî girtine, bi huner û nirxdarya sêwirdaryê dagirtîne her usa, çawa yên herd bendên dinê. Dastanên ku dengbêjek straye, pey hev nînin. Bi navê dengbêj nehatine ders kirin. Stranên dengbêj li benda pêşin, duda û sisyanî jî rast pê tînin. Lê şaxên dastanekê, yên stranbêjên cude gotine, me gîhandine hev û bi hevra çap dikin.

Gelek dastanên ji vê berevokê tradîsyonêlin û zûva di nava gelda naskirîne. Wek mînak: *Mem û Zîn; Binefşa Narîn; Xelîl-bego; Sîyabend û Xecêzerê; Kerr û Kulik* û yên mayîn. Çend şaxên ji van dastana berê me li hine belavokanda bi tîpên kîrîlî weşandine. Şaxên nû û yên berê çapkirî me gîhandine hev û bi hevra diweşînin.

Şax ji hev cuda dibin bi hostatî û taybetmendîya bi zar hûnandina zarbêjava, bi dewlemendîya ziman, berfirebûn û bi kamilbûna navarokêva. Mînakên şaxên tomarkirî me hilnebijartine bi çêtirbûn û ne çêtirbûna wana. Şertê ber me ew bûye, ku mafê jîyana hemû mînaka heye û dibê hemû jî bêne weşandin.

Dastan bi şaxên xweva bingehîn bona zanistîyê û îşaretê didin ser belavbûna wane gêografîk li seranserî Kurdistanê. Pîrbûna şaxên berhemê ber me radixin landşafta Kurdistanêye êtno-kultûrîyê ya berfire, rengîn û dewlemend. Weşandina şaxên, ku me ji zarbêjên herêmên Kurdistanêye cude-cude, ji hev dûr û belabûyî girtine, ber xwendevana xweşbînî û pîrrengîya wana vedikin. Balkêşe û cîyê kêfxweşîyêye, wekî stranbêj û dengbêjên me nek tenê kurd bûne, lê usa jî bi neteweya xwe (ermenî û asûrî), ziman (zarav û devok) û ola xwe ewana ji hev cude bûne.

Dewra zarbêjan di jîyana kurdaye herrojîda mezin bûye. Zarbêjî hêzeke giring û bingehîn bûye, wekî gelê kurd xuyatî û zimanê xwe heta îro zêndî û zengîn parastye.

\*\*\*

Kurdistan – welatê kurda, paêpirê welatekî çiyayîye, bi çîya û gelîyava dagirtîye. Herêm-herêm li ser xaka Kurdistanê bigerî, dibînî çîya ber çîya vedibin, yek ji yê dinê bilindtir û bi taybetîre. Çîya bi gelîyên kûr, çem û çemikên xurt ji hev birr dibin.

Çemên ji berzaya zozana diherikin berbi jêr, wek xeta sînora navbera wan çîya, tîn û bi hezar terzî birq vedidin û derbaz dibin. Gelî, çîya, çemên pirrav, hemû tişt ser vî erdî bi heybete. Surr û sêr di wanda veşartîne. Hêzeke batîni wana him ji hev vedîqetîne, him bi hev girêdide.

Merîyên van çîya hînî xu-xeysetê vî erdî bûne. Sirûşt û meriv di navbera hezaran salanda bi hev hatine hûnandin. Ji ber vê jî ne kurd bê çîya dikarin bijîn û ne jî çîya bê kurd dikarin bijîn. Yek bi yekîva jîyandare, xurte, bi pişte, bêxofe û xaştire. Rêza çîya, ku ber hev vedibin, tu dibêjî qey pehlevan û eshebene rabûne govendê.

Kurdistan welatekî avsûniye. Her alî nava gund û zozanên kurda bigerî, rastî avsûn û lêgênda dibî. Kurd bi avsûna dijîn, bi wan avsûn û lêgênda mezin dibin. Hemû bûyar; serborîyên kurda dibin lêgênd, stran, dastan, dev bi dev digerin, bi perr û bask dibin, difirin, dem û dewrana derbaz dibin.

Zargotina kurda ew dengê jîyana sirûştê û merîyên wî erdîne, ku bûne stran, bûne dastan, roman, serborîyên pehlevanan û cengewaran.

Mezin bûye dewra dastan-êpên kurdî di nava jîyana kurdaye sosyal-abûrîyêda.

Dastanên kurdî yên êpîkî, di xezîna mîrata berhemdarya gelêriye devkîda janra (malbata) here belabûyîye. Mezin û berbiçav bûye bandûra dastana di jîyana gelêrîda. Di çarçova hemû qatên çivakêda cî û rêza dastana hebûye. Dastan gotine li gunda, li bajaran, li nav gel li sûka û çarsuada, li birc û serayên mîr û hakimanda, odayên xanedanên kurdanda, di bin banê ocaxên mêrên navgiranada, di zozana bin reşkonên beg, begler û malmezînanada.

Dibistana dastanbêja çivak bûye, civat û şevbihêrkên herrojî. Şuret zên û jêhatî ji salên zarotîyê despêkirî, ber her kesî rîya hînbûnê vekirye.

*Dastan* gotineke îraniye bi mana berhema êpîkî ya devkî. Ev gotin bi hemî navarokî bi zimanên farisî, ermenî, turkî, azerî, erebî, kurdî kar anîne. Dastanên belavbûyî û naskirî sînora nasnekirine. Angorî hêza her zimanî, hunermendîya zarbêja bi hemû zimanên jor navkirî dastan hatine gotinê. Gava navaroka dastanê hevgirtî bi jîyana wî gelî bûye û tiradîsyonên zargotinbêjyêva rê çûye, ew nava wî gelî cî girtye û temendirêj bûye. Mînakên balkêşin dastanên *Leyl û Mecrûm*; *Ûsib û Zelxê*; *Xosrow û Şîrîn*; *Şêxê Senanîya û dota gurca* û yên mayîn, ku sînora navbera çanda gelên cînar qut kirine û derbazî nava çanda yekû du bûne.

Dastanên li jor navlêkirî nava kurda gelekî naskirî û hizkirîne. Rex wana bi dehan, belkî sedan dastan hene, ku li ser erdê Kurdistanê, nav gelê kurd sêwirîne û jîyana xwe heya naka jî li Kurdistanê berdewam dikin. Mînakên xuyanin dastanên: *Cebelîyê kurê mîrê Hekkarîyê* (bi navê *Binefşa Narîn* jî tê naskirin); *Kerr û Kulik*; *Xellî-bego*; *Dewrêşê Evdî* û gelekên mayîn.

Dastanên kurdî gorî navaroka xwe para vedibin ser du birra: yên evîndaryê û yên mîrxasîyê-dîrokî. Xeteke sor navbera van herdu birra derbaz nabe. Dastanên evîndariyê hene, ku usa jî dikarin wek yên mîrxasîyê-dîrokî bîn hesabkirin. Ji berhemên vî rengî, wek mînak em dikarin dastanên *Dewrêşê Evdî*; *Kerr û Kulik* û yên mayîn destnîşan bikin.

Dastan ew romanên gelêrîne. Ev navlêkirin raste, bi cîyê xweye, lê bi giştî çarçov

û xalên taybetmendîya wê nade xuyakirin.

Kîjanin ew xal? Êpîka, ne çîrokin, ne tenê pexşanin. Ewana divê usa jî bi hang û bang, teql bin, bi strankî û bî çîrokî bêne qedandin, awazek divê pêra hebe. Hang û bang, awaz alîkarin, wekî dastan bêtir bi heybet, bi bandûr û bi baldarî bê bihîstinê. Qedandina dastanan gelemperê seheta kişandine. Dastanbêj hebûne, ku hunermendîya wana têrê kirye, wekî dastan çend şeva jî dirêj bikin, bêy ku baldarya guhdara ser kêmbibe. Hilbet, strandina bi seheta bona dastanbêja gelekî giran bûye. Di rastiyêda tu kes nikare bi bînekê sehetava bistrê. Ji ber vê jî stranbêj tevî strandina bi hilbestkî gelemperê cîcîyan navbirîyê daye, bi çîrokî gotye û paşê dîsa straye. Bona alîkaryê amûreke mûzîkayê: tembûr, kemança, yan tîstekî dinê kar anîye.

Dastanbêj hebûne mîna dewrêşên gerok, defik xwera gerandine. Gava dastan gotine, ber teqla dengê defikê hang û bangên berhemê gelekî bi çapik, şidyayî û xurt bûne. Bi vî rengî dastanên *Dimdim (Xanê Çengzêrîn)*; *Zembîlfiroş* û yên mayîn hatine qedandin.

Di bingeha destanada bûyarên li rastiyê pêkhatî cî girtine. Pêşiyê li ser wan bûyara strane û di heman herêmêda gelêrî bes kirine, gotine, paşê ji ber giringayê û bandûra bûyaran ser agahdara, ew derbazî herêmên cînar bûne, belayî nava gel bûne û stran bere-bere qedema dastanbûnê girtine. Di vê meşa belabûnê û qedemgirtinêda peyda bûne êlêmêntên evsûnî yên tradîsyonêl. Mêrxasên dastanara hêza pelevana hebûye, qewata hespê wana ji batinyê hatye û hesp jî mîna sîyarê xwe xurt bûne.

\*\*\*

Civandina dastanên kurdî ji nîveka sedsalîya XIX despê dike û ew bi navê zanyarê kurdî mezin Mela Mehmûdê Bazîdî û konsûlê Rûsyayê li Erzerûmê Alêksandr Jabava tê girêdan.

Salên 1850-60-î Alêksandir Jaba tevî civandina destnivîsên kurdî û amadekirina wana bona çapkirina zanistî, bala hevkarên xwe yên kurd, rewşenbîrên welatparêz, bi serkêşîya Mela Mehmûdê Bazîdî, di meydana lêkolîn û civandina çanda kurdî ya devkî û nivîskî, naskirina rabûn, rûniştin, xuyatî-xaraktêra kurda karekî berfire despê dike. Di çarçova vê bernamêda Mela Mehmûdê Bazîdî ji farisî ser kurdî vedigerîne Şeref-name-ya Şeref-xanê Bitlîsî. Ew bi nivîsandina dîroka kurd û Kurdistanê ji dema Şeref-xanê Bitlîsî, li ku Şeref-nama xilas dibe virdatir; heta dema nîveka sedsalîya XIX xwe gîro kirye.<sup>1</sup> Zanyarê kurd lêkolîneke berfire amade kirye ser edetên kurda; M.M.Bayazîdî tevî A. Jaba amade dike ferhenga kurdî firansî; ferhengeke berfire ya îdêom, dîalogên kurdî.<sup>2</sup> Bi destê Mela Mehmûdê Bazîdî hatine nivîsîn usa jî stran û

1 Mixabin ew destnivîs, ku wî şandibû Pêtersbûrgê Akademya Russyaêra unda bûye û heta naka nehatye dîtin. Her pêşgotina vê nivîsarê maye.

2 Ew xebata pîrbelg hên çap nebûye. Destnivîs ji hev veqetandî ser sê parçayan li arxîv û fondên ji hev dûr tî xweykirin.

avsûnên kevn. Şedetya vê heye li bîranînên zanyarê rûs P.A. Çixaçovda.<sup>3</sup>

Balkêşe, ku A. Jaba şaxên dastanên *Mem û Zîn û Sîyabend û Xecêzerê* yên gelêrî wergerandine ser zimanê Fransî bi wê hîvîyê, wekî vana bi zimanê kurdî, bi werger û têbînîyên ser zimanê fransî li Parîzê bide weşandin. Mînakeke gelêrî ya *Mem û Zîn-ê* bin navê: *Legénde Kurde traduit du Kurde par' Augustê Jaba ancien Consul de Russie et Erzeroum* dîyarî tercumanê Fransyaê li Turkyae Şêfêr kirye, bi hîvîya wekî ewî li Parîsê bide weşandinê.<sup>4</sup> Mînaka duda bin navê: *Résumé de l'ouvrage Kurde a' Ahmed Efendi Khani, fait et traduit par' A. Jaba Consul de Russie a' Erzeroum, Conseiller d'Etat et Chevalier des'ordre de St-Anne de la 2<sup>e</sup> classe*, li sala 1857 amade kirye.<sup>5</sup>

Al. Jaba destnivîsa dastana ser Sîyah Ahmed û Şemsî qîza Îbrahîm-paşayê millî (Her ew Sîyabend û Xecêzerêye), ku M.M.Bazîdî nivîsibû, bi nivîseke wek pêşgotinê ya kin, bi wergera ser zimanê firansî tesmîlî M.De Tchihatcheff kirye. Ew nivîs li sala 1859-a li kovara *Journal Asiatique* hatye weşandin.<sup>6</sup>

Ser rîya civandin û lêkolîna zargotina kurda, bi taybetî di bergeha dastan-êpîkyêda nîrxgirane keda du zanyarên alman Albêrt Socîn<sup>7</sup> û Eugen Prym.<sup>8</sup>

Herdu zanyar bi tevayî bi armanca lêkolîna zimanên Rohilatê li sala 1868-a bi rêwîtiya zanîyaryê pêşiyê diçine Misirê û salekê şûnda têne Sûryaê û hîjde mehan bê westan li wê kar dikin. Hatina Şamê ji wanara bona lêkolînê dergê fire vedike. Vira ji wanara lev tê tevî zimanê erebî lêkolînên xwe ser zimanê sûryanî û kurdî xurt bikin. Armanca wane giring bû ser van zimana civandina têkstên gelêrî ji zanayên zimanê kurdî û sûryanî.

Li Suryê herdu zanyar li Malûlayê, di bingeheke rehberên sûryanî yên kevnda, dest bi lêkolîn û hînbûna zimanê aramî dikin. Jiyanivîsên ser van herdu rojhilatnasan didin xuyakirin, wekî ewana li bajarê Şamê nasya xwe dane bi xaçparêzekî yakobît û wî destnivîseke mezin, berevokê zargotinê bi herdu zimana kurdî û asûrî raberî wana kirye. Ew berevok bûye bingeha nivîsên wana.

Di heman çaxê ewana li Şamê rastî karkerekî asûrî tên bi navê Cano û pêra dûr û dirêj kar dikin. Cano herdu zimana, sûryanî û kurdî baş zanibûye. Tevî vê zimanzanebûnê, bi şedetîya Socîn û Prym, Cano stranvan û çîrokbêjekî jêhatî û hoste bûye. Wî gele mînakên zargotina herdu zimana ji wanara gotye.

Wek herdu zanyar dinivîsin, li herêma Tûr-Abdînê (Turkyae) dema berdewamiya

3 П.А.Чихачев. Письма о Турции. Москва 1960, с. 37.

4 Paris Bibliothe'que inter universitaire des Langues orientales. Q.Q.I.84 / D. 19961. (Ser rûê pêşin nivîsiye: "Hommage du traducteur à Monsieur Schefer interprete).

5 Binhêr'e: Arxiv Bostokovêdov Instîtûta Vostokovêdenîya AN SSSR. F. 36, op.1, Nr. 20.

6 Jaba A. Ballade kurde recueillie et traduite par A. Jaba, et communiqué par M. de Tchihatcheff. *Journal Asiatique*. Sér. 5, 1859. T. 14. P.153-166.

7 Albert Socin 13.10.1844-a li Bazêlê/Şwayz ji dayik bûye û li 27.06. 1899-a Leipzigê wefat kirye. Xwendîna xwe ser zimanên Rohilatê li bajarên Baselê, Jênevê, Gyottingênê û Berlînê girtye. Xwedîyê pirtûkên giranbahaye.

8 Eugen Prym - 15.12.1843-a li Dyurêne ji dayik bûye û li 06. 05. 1913-a wefat kirye. Ser pisporya zimanên Rohlatê û li ser zanistya berhevdana zimanan xwendye. Xwedîyê p'irtûkên hêjane. Eugen Prym û Albert Socin hevalên xwendinê bûne.

lêkolîn û civandina stran û çîrokên kurdî ewana tên ser wê rastîyê, wekî li wê herêmê makzimanê asûrîya cîyê xwe hiştîye zimanê kurdîra û pêra jî stran û çîrokên kurdî ji wanara gelekî hizkirî bûne.



Alêksandr Jaba



Albêrt Socîn

Berhemên êpîkî yên Albêrt Socîn û Eugîn Prym weşandine, pir giringin ji boy zanîna, bersiva pîrsa, gelo sed û pêncî salan berê di nava kurdanda çi beyt û dastan hebûne, naskirî bûne û ewana ser çi astê bûne. Bi vê yekê, derfet çê dibe, ku zanyar bi ziman û şaxên çap bûyî û bi yên di dema meda hatine civandin, berhev din û guhastinên di nava ziman û hunerêda cî girtî bidin xuyakirin.

Berevoka civandina zargotina kurda bi destê A.Socîn û E.Prym ji du pirtûkên têksta û du pirtûkên wergera ser zimanê almanî pêk tê. Rex berhemên naskirî, ku li hemû parçeyên Kurdistanê distirên, wek: *Mem û Zîn; Ferx û Stî; Cembêlî û Binefşa Narîn; Zembîlfîroş; Yûsuf û Zelîxa; Cimcimî Sultan; Beyta Hespê reş; Dimdim û Sisêbanê*, yên ku di dewra meda jî dengbêj distrên, zanyarên alman berhemên usa jî nivîsîne, yên naka rastî me naên, wek: *Ahmedî Şeng; Boz-begê;*<sup>9</sup> *Hemateyar; Xalid-aşa; Evdal Omer; Êzdînsêr; Mehmedê Xano*. Ji van berhema payê pîrrê beytkî hatine gotin. E.Prym li 1870 li Bonê ser lêkolîna têkstên van berevokan (ser zimanê axaftina herêma Tûr-Abdînê: aramî û kurdî) têza xwe ya hebîlîtasyonê parastîye.

Li sala 1960-î li Moskwayê ji aliyê weşanxana "Xûdojêstvēnnnaya literatura" berevokê têkstên surîyanî ser zimanê rûsî bi navê "Ji Axîkar heta Cano" ronahî dîtye.<sup>10</sup> Di vê pirtûkêda têkstên surîyanî ji kevnezeman despêkirî heta sedsalya XIX,

<sup>9</sup> Şaxeke beyt-dastana Boz-begê bi sernivîsa "Şer'ê Boz-begê û Dewrêş-aşa" di arxîva rohilatnas û zanyarê îslamê alman Martîn Hartmannda (09.12.1851 Breslau - 05.12.1918 Berlin) Ordîxanê Celîl peyda kirye û li pirtûka xwe "Stranê k'urdaye t'arîqîyê" (SPb 2003, rû 716-720) weşandiye. 10 От Ахикара до Джано. Тercme ji sîryanî A.Bêlova, L.Vîlskêr. Moskva-Lênîngrad 1960.

dema A.Socîn û E. Prym ji Cano nivîsîn, cî girtine. Ji gotinên Cano têksta pêşin ew "Memmo û Zîne" û ya duda "Ozê û Amşê"-ye. Ozê û Amşê serpêhatya Mîrzikê Zazaye, ku li nîveka pêşine sedsalya XIX nav û mêranya wî bûne bingeha stran û dastanan û bela bûne nava kurda, asorya û ermenîya. Lê *Mem û Zîna* ku Cano gotye ji sê parçane, herdu parçên pêşin navarokê wana peywandîya xwe bi dastana kurdîra tune, ewana ç'îrokne serbixwene, ku bi navarokî ji dastana kurdî dûrin, lê navê mêrxasê hersêya jî Memoye. Para sîsya çêrkirina dastana *Mem û Zîne*.

Zargotina kurda nava gelên cînar gelekî belabûyî û hizkirî bûye. Di civaka wanada dastan strane, qal kirine bi kurdî, bi ermenî û asûrî. Jîyana herrojî û tevayî van hersê mîletan bi çand û çivak nêzikî hev kirine.

Berhemeke waha, ku nava gelên cînar ermenî, kurd û asorî naskirî bûye, ew serpêhatîya mêrxasîya mîrê Rindwanê (li qeza Sêrtê) Mîrzkê Zazayê êzdî bûye. Lêkolînên ser jîyana Mîrzikê Zaza xuya dikin wekî ew mîrekî adil û xêrxaz bûye bona hemûya: kurda, asorîya û ermenîya yên ser erdê wî jîyane.<sup>11</sup> Xuyatîya Mîrze-aşa ya merivhizyê, mêrxasya berxudanê dijî serdestên Osmanîyê û şehîdbûna wî ye egîrî, bûne mijara çîrok, stran û dastanan. Eva bûye bingeh, ku Cano bihîstye û serhatîya wî ji E.Prymra qal kirye.

Ji berevok û nivîsên ser dastanên kurdî yên bi nirx, ku li despêka sedsalya XX hatine weşandin, divê em dû pirtûkên hêja destnîşan kin. Yek pirtûka S.Haykûniye, ku me ser wê di benda vê zincîrêye pêşinda, li pêşgotinê û paşkokê ser danasîn daye û ya duda ew herdu pirtûkên zanyarê alman Oskar Manne, ku ji ger û lêkolîna wî ye bi armanca naskirina welatê kurda, xeyset, ziman û çanda wî peyda bûye. Oskar man du şaxên dastana Dimdimê nivîsîne û bi wergera ser zimanê almanî weşandine.<sup>12</sup>

\* \* \*

Ji rewşenbîrên gelên cînar ku zêde bala xwe ser çand û zargotina kurda dane ew ermenîne. Zanîna zimanê kurdî ber hinekên ji wana rê vekirye, wekî zargotina kurda ji nêzikayê û bi kurdî nas bikin û nimûnayên balkêş ji stran, dastanên kurdî binivîsin û li kovarên xweda biweşînin, da ku gelê ermenî pê bibe nas.

Evîndarekî zargotina kurda bûye X. Abovyan: ronakbîrê ermenyayî nav û deng. Pey xilaskirina ûnivêrsîtêta Dorpatê bi zimanê almanî û vegera wî Ermenistanê, xizmeteke mezin bû bona zanîyarên alman, yên dihatin Ermenistanê wekî hilkişin serê çîyaê Ararate. Bona gişka rêberê wana X.Abovyan bû. Dema rêvîtyê ewana rastî gundên kurda dihatin û malê wanda dibûn mêvan. Abovyan mêvana bi erf-edet û zargotina kurdaye dewlemendva dikirin nas. Kurd şevbihêrkên xwe bona mêvana bi stran û çîroka derbaz dikirin. Morîtz Wagnêr; yek ji wan rêwîyan, dema dîtinên

11 Ordîxanê Celîl (Celîlov). Stranê k'urdaye t'arîqîyê. Sankt-Pêtêrbûrg. 2003; Celîlê Celîl. Sêzde r'ûp'elên balk'êş ji dîroka gelê k'urd. Wien 2002.

12 Oskar Mann, Kurdisch-Persische Forschungen. Die Mundart der Mukri-Kurden, Abteilung IV Bd III, T. II, Berlin, 1909. S. 471-478.

xwe li ser wê rêwîtiyê xwest biweşîne, ji Abovyan hîvî kir nimûneyên stranên kurdî binivîse û jêra bişîne. X.Abovya daxwaza zanîyar bi dilxweşi cî anîye.<sup>13</sup>

Salên 60-70-î sedsalya XIX gava baldarya rewşenbîrên ermenîya ser zargotina gelê ermenîya xurt bûye, berevker bê agahdarî ber stran û dastanên kurdî derbaz nebûne. Li ser rûpelên kovarên ermenîya em dibînin berhemên zargotina kurdî bi werger hey carana dihatin weşandin. Dastana *Leyl û Mecrûm* Bênsê (Sahak Movsîsyanyan) li sala 1896-a li kovara "Nor dar"-ê;<sup>14</sup> Garêgîn Srvantsyants *Serê Sîpanê yan Sîabend û Xecêzerê* li sala 1884 li pirtûka "Hamov – hotov"-ê diweşîne. Baldarya Srvantsyants ser zargotina kurda bê bingeş nîbû. Ew merivekî ruhanî bû, mamûstakî naskirî li Ermenistanê, ku dem û hereketa xwe dîyarî lêkolîna rewş û rûyê ermenîya, ziman û zargotina wan kiribû. Ewî ku bibû evîndarê lewza gelêrî, nikarbû bêagahdarî ser çanda kurda derbaz bibya. Wî mereq dikir, wekî merî hebin zargotina kurda bi makzimanî binivîsin. Ewî hê 150-160 salan berê, ji ber ku kesî ji kurda yekî rewsenbîr wekî xwe bida ser vî karî nedidit, bi îniyatîveke balkêş pêjda hat. Di pirtûka xwe "Hamov – hotov"-da gava ser dastana *Sîyabend û Xecêzerê*-xever dide, ji rêberên Xwendîngeha ermenîya li Kostandinopolîsêra (Stambûlê) pêşniyar dike, tevî civandina zargotina ermenîya agahdarya xwe bidîne ser zargotina kurda. Di not-bîranînên xweda G.Srvantsyants bilind nirxandîye pêşketin û pîrrengîya ziman û hunera peyva gelêrîye kurda. Wî di pêşniyara xweda dinivîsî: "...wê karekî kêrhatî be, heger [hûn] karmendekî veqetînin bona pêkanîna civandina zargotina kurda".<sup>15</sup> Gotina xwe G.Srvantsyants aha mak dike: "Ji ber ku kurd bi ermenîyara binelîyên ser erdekêne û jîyana wana bi hevra girêdayîye, [kurda – C.C.] gele melumetîyan raber dikin ji wan kesana, yê bala xwe didine ser ermenîya. Ji ber ku kurd miletekî ezberê, her wek kurda ezberin usa jî ermenîyên me yê herêmên çiyayî, cî çiya jî bi kurdzimanin, zargotinberevkîrek hema ji ber nivîsandina stran û dastanên bi kurdî sêwirandîyava dikare bive xwedîyê navekî qenc."<sup>16</sup>

Lêkolîn û civandina zargotina kurda pey Şerê cihanêyî pêşin, li Sovêtê ji salên pêşinva bi bernema zanistî û piştovanîya dewletê despê bû. Ev hilwesta dewletê ber çand û huner, ziman û zanistîya gelêrî berdewam kir heta hilweşîna wî. Di despêkêda populer bûn gazîyên: her tişt bona gel, her tişt ser gel bê lêkolîn kirin û weşandin. Di nava salanda ew kar ji heyteholê despêkê bû parçeke jîyana gelên komara Sovêtê.

Ji kurdên hersê komarên Kavkasyaê: Ermenistanê, Gurcistanê û Azîrbêcanê, tenê yê Ermenistanê bûn, ku bingeha naskirina çand û zimanê kurdî pey Şerê cihanêyî duda hat parastin. Mafê zimanê kurdî bona xwendinê, nivîsandinê û weşandinê tenê li Ermenistanê pey mirina Stalîn (1953) vegerya, jîyandar bû, lê belê, îjar gelekî

13 Wagner M. Reise nach dem Ararat und dem Hochland Armenien mit einem Abhange: Beitr. Zur Naturgeschichte des Hochlandes Armenien. – Stuttgart, Tübingen, 1848; Wagner M. Reise nach Persien und dem Lande der Kurden. Bd.2. Leipzig 1852; Wagner M. Travels in Persia, Georgia and Koordistan, with sketches of the Cossacs and Caucasus. From the german. Vol. 3, L. 1856.

14 "Nor-dar". 1896, Nr. 141, 142.

15 G.V. Sruanztyants. Hamov – hotov. K.Polis 1884. Rû 268

16 Her li wê, .



bi qusandî û çarçovkirî. Meşa berfire bona lêkolîn û nirxdayîna ziman û çanda gelêrî bona kurda li Azîrbêcanê hên di salên sîf hatibû fetisandin. Pey şerê dijî Hitlêr navê kurd li vê komarê bi kok hate rakirin, mafê kurda hate pêpeskirin.

Li salên 1921 – 1991, navbera heftê salanda, bona lêkolîna rewş, rabûn rûniştina gelê kurda, zargotin û zimanê wî li Sovêtê karekî mezin û hêja hatye kirin. Dastanên kurdî di vê meydanêda him bi kurdî, him bi werger ser zimanên ermenî, rûsî û lîtwanî hatine weşandin. Bona vî karî çalekî û pisporya xwe nehêwşandine rewşenbîr û zanayên kurdên Ermenistanê yên silsila pêşin, wek Ereş Şamîlov, Hecîyê Cindî, Casimê Celîl, Emînê Evdal û yên mayîn. Bona pêşketina ziman û edebyeta kurdî, zargotina zengîn çavkanîya giring û bingehîn bûye. Salên 50-î gava edebyeta kurdên Ermenistanê pey Şerê cihanêyî duda hê piştî xwe rast nekiribû Casimê Celîl û Hecîyê Cindî bi du berevokên hilbestvanîyê ser bingeha dastanbêjîya kurdî, bi dehan cewahirên êpîkîyê li ber xwendewan û rewşanbîrên Ermenistanê bi zimanê ermenî: *Dastanên kurda yên evîndaryê*<sup>17</sup> û *Dastanên kurda yên mîrxasyê*<sup>18</sup> pêşda hatin. Bi vê wana baldarya rewşanbîrên ermenîya, desthiladarên komarê kişandin ser çanda kurda ye berz û bi nirx.

Hêjayî gotinêye, wekî dastanên kurdî di edebyeta ermenîyada hên ji berêda hizkirî bûne. Gele hilbestvan, pexşannivîsên ermenîya yên navdar navaroka dastanên *Mem û Zînê*, *Sîyabend û Xecêzerê*, *Meme Eysê*, *Lûr-de lûr* û yên mayîn kirine bingeh bona nivîsandina berhemên xwe yên navûdeng.

\* \* \*

Di vê berevokêda 49 berhemên kurda yên naskirî bi şaxên xweva cî girtine. Dastanên ku me navbera salên 50-î û despêka salên 60 nivîsîne raste-rast ji devê zarbêja girtine û wek wana ji mera gotine li ser pelên deftera me nivîsîne; paşê, ji nîveka salên 60-î bona deng girtinê teyp-denggirtinokên cure-cûre kar anîne; ji dawîya sedsalîya XX û despêka sedsalîya XXI karê me ser dîgîtalê meşyaye.

Di rêza dastanên ku di vê bendêda cî girtine, hene yên naskirî û hene kêma naskirî. Ji yên naskirî *Mem û Zîn*; *Sîyabend û Xecêzerê*; *Binefşa Narîn* (Cebelî kurê mîrê Hekkarîyê); *Zembîlfiroş*, *Xelîl-begê mire Heyalê*; *Sêva Hacê* û yên mayîn. Pirin dastanên ku heta naka nehatine nivîsîn û weşandin, wek: *Eysa Îbê (Bozanê lawê pîrê)*, *Fatîma Salîh-aşa*; *Strana herdu bira: Zalim-begê û Nasir-begê*; *Hemdîn û Şemdîn*; *Qumrî Xatwîn*; *Hesenê Alikî*, *Kejê û Salo*; *Meleknaz* û yên mayîn.

Berfireye erdnîgarya nivîsandina beyt, dastanan-berhemên êpîkîyê, yên li vê bendêda cî girtine. dastanên tomarkirî, ew berhema ji rêwîtiyên me bûne li ser erd-xalîya herçar parçeyên Kurdistanê û dîyasporayê. Hîmlî evin herêmên giring, ku em lê qesidîne û me li wê dastan nivîsîne:

17 Casimê Celîl. Kirdakan sîravêpêr. (Bi zimanê ermenî). Yêrêvan 1955;

18 Hecîyê Cindî. Kirdakan joxovîrdakan vîpyêrg. (Bi zimanê ermenî). Yêrêvan 1960.



1 Li Suriyaê Çiyayê Kurmanc, Kubanî, Heseke, Qamişlû, Tirba Spî, Dêrik, Endîwar: Dastanbêjên me bûne: -Şêx Adîkê Hesnecarî (li bajarê Efrînê); Nasirê Şamê (li gundê K'ifirzîtê); Cemîl Horo (li Helebê); Ebdul Qadir Hesên Nazî (li Helebê); Rifatê Darî (li Qamişlûyê), Silo Koro (li Dêrikê, gundê Qereçox).

2 Dihokê (Behdînan) - Îsmâîlê Ewdîşo Yoxanu, Fehmî Ebdulla Xelîl Belevayî ji Amêdîyê.

3 Amedê (Diyarbak'ir) - Şex Dewrêş Hecî Şêxmûs; T'ehsînê P'asûrî.

4 Ermenistanê - Cindîê T'êco (gundê Gelto), Et'arê Şero (li zozanê Egrîçê, Yêrêvanê); Feremezê Ezdo (li gundê Yêxêgnûtê- nehîya Hoktêmbêryanê); Çerkezê Ayib (li Yêrêvanê); E'gîtê T'êcir (li gundê Sîçanluê, ser nehîya Telînê), Morofê Meh'mûd (li sovxoza 38-a ser nehîya Aştarakê) û yên mayîn.

Ji stranvanên ermenî, yên ji Bakûr û Rojavayê Kurdistanê vegeryabûn Ermenistanê û kurdziman bûn: Îsê Vartê (Ohanyan Îsraêl); Hovhannîsyan Karapêt; Aslanyan Movsês; Sîmonyên Hovsêp'; Îskender (Hovsêpyan Hovhannês), Aslanyan Pêtros; Manûkyan Sêrop û yên mayîn bûn.

Zarbêjên dastan û berhemên êpîk gotine ji temenî navseriyê hetanî nod salî bûne. "Dibistanên" zarbêja li ku ewana hîn dastanbêjiyê bûne, ew pêşiyê mala wana, malbata wana bûne. Zarbêj pêra jî her cara odeyên gund û çivaka der dora xwe destnîşan dikirin.

Zarbêjên ermenî, her wekû gelek dastanbêjên me yên kurd jî, dengê xwe li radyoa kurdî spartine. Ji wana Karapêtê Xaço, Îsê Vartê, Îskender û yên mayîn, ku nav guhdarvanên radyoê xweş naskirîne, hertim mêvanên mala me bûne û ji mera bona nivîsandinê dastana gotine.

\*\*\*

Li vê berevokê çar şaxên dastana *Mem û Zîn-ê* ya gelêrî têne raber kirin.

Şaxên *Mem û Zîn-ê* bi navarok ji hev cude dibin. Ev cudabûn dide xuyakirin, çiqas dewlemend û pirşaxîye dastan, ku nava gelda ewqas perr vedaye û bi hunera gelêrîva dagirtî maye. Ser vê dewlemendiyê û bilindaya navarokê Ahmedê Xanî bendewar bûye, ku dest avîtye nivîsandina poêma xweye nav û deng. Poêma Ahmedê Xanî bûye cewahira edebyeta netewa kurd. Bi popûlarîtêta xweva ew li her çar aliyê Kurdistanê hatye naskirin û ji sînore wî derketye, bûye heykeleke navneteweyî ya hunera fikir û ramana bilind.

Dastana *Sîabend û Xecêzerê* her usa çawa Mem û Zîn nav kurda deng daye û hizkirîye. Ew nek tenê bala zanyar û kurdzanên sedsalya XIX M.M. Bayazîdî, A. Socîn û yên mayîn kişandine ser xwe. Dastan heta rojê me jî ser zarê kurdan zêndîne û bi hunera xweye berze efrandaryê, bi k'ûraya hisa evîndaryêye tragîk dilê guhdara dihingêvin.

Di berevoka benda 2-da cî girtine çar şaxên dastana "Sîyabend û Xecêzerê (bi

navên: Sîyad Ahmed; Sîyabendê Silîvî û Sîyabend û Xecêzerê). Şaxa pêşin me girtye ji binelîyê gundê Şadêrê (qeza Efrînê, Sûrya), ji kurdekî êzdî Ahmedê Nêsir; şaxên duda û ya sisya li Yêrêvanê ji zarê Îsê Vartê û Aslanyan Movsês nivîsîne. Ewana eslê xweda ermenîne, jîyana xwe di nava kurdên reşkota derbaz kirine û makzimanê wana kurdî bûye. Ji Turkyayê hatine Sûryayê û ji wêderê jî Ermenistanê. Şaxên dialogê belabûyî bûne li Ermenistanê û dighîjin li şaxên, ku dengbêja li Serhedê strane.

Dastana Sîyabend û Xecêzerê bi du şewe tê naskirin. Yek, baldarî zêde ser çîroka jîyan û evînadarya Sîyabend û Xecêye; yek jî, giraniya navarokê dialoga navbera Sîyabend û Xecêzerêye, xatir ji hev xwastina wane berî mirinêye.

Ji van herçar şaxa em dibînin ku hersê şaxên pêşin, yên ji Efrînê û ji welatê Bişêrîyê ji nava êla reşkota gihîştine destê me, ew ser jîyan û serborîna herdu evîndarane, lê şaxa çara ku Cindîyê T'êco gotye (li gundê Gelto, nehîya Talînê, Ermenistan) ew hlbestkiye. Dastan di nava kurdên (êzdîyên) Ermenistanê bi strankî naskirî bûye. Çîroka serborîya evîndara hergê hatye gotin, her tenê bona bervedankê bûye. Ji ber vê jî dastan di nava kurdên Kavkazyayê wek stran hatye navlêkirin. Me du şaxên strankî li vê berevokê cî kirine bi wê bawerîyê, ku dastan ser jîyan û serborîyê û dawî, ku bi strankî ser hevda tê, divê bighîjin hev, wekî dastan kamil bibe.

Di berevokêda pirhijmarin (heyşt berhem) şaxên beyt-serhatîya *Zembîlfiroş-ê*. Beyt-serhatî li hemû herêmên Kurdistanê distirên. Pênc şaxa me ji zarbêjên Ermenistanê û Gurcistanê girtine, yek ermenî Sincoyan Manûk gotîye, ku pey şerê cihanêyî pêşin ji herêma Sasûnê (Turkyayê) werguhêzî Ermenistanê bûbû, yek ji dewrêş Hecî Şêxmûs li Dîyarbekirê girtye, yek jî me nivîsiye li Dihokê (Herêma Kurdîstana Azad, Îraq) ji Fehmî Ebdilla Xelîl Bilaveyî. Şaxên li Ermenistanê û Gurcistanê nivîsî bi navarok û strûktura nêzîkî hevin.

Çend peyv ser dastanbêjanda!

Pirrengîya stranvanên dastanan, beyt-êpîkên vî bendî, ew bi giştî nîgara her 25 bendên berevokêye. Dastanbêjî, beytgotin hûnerêke taybetîye, ku herkes nikare xwe bide ber. Zarbêjara şureta çîrokbêjîyê, naskirina daxwaza oda guhdarvanên pirhijmar giringe. Dengbêjara deng û zêna hunermendîyê jî divê hebe. Tevî pêrfêkt zanîna zimanê kurdî, zarbêj divê xweyê zengînya kîlera peyva kurdî, biwêja, gotinên pêşîyan be. Û ya here giring, divê ew jêhatî be, wekî karibe ji berxwe bisêwirîne, şureta împrovîzasyayê pêra hebe. Dastanbêj ser rîya efrandarya dastanbêjîyêda çiqas hoste û xurt be, awqas berçavan dibe. Lewza wîye taybetî, zimanê wî yê bedewetîyê, rêzasazîya xoşpeyvîyê, sifet, dîdemên ji taybetmendîya wî xulîqî, evin rêberên wî di bergeha zargotinbêjîyêda.

Di rêza navên dastanbêj, beytbêjên meda navên naskirî ji alîyê gelê kurd û kêrnaskirî hene. Navdarbûn û kêrnaskirî navdarbûn naê ser wê watê, ku berhemên, ku me ji wana nivîsîne zêde yan kêrnaskirî hêjane. Naskirîbûn û kêrnaskirîbûn girêdayîye bi hilwesta wane di çivakêda. Ne timêye ku zanayên dastana xwe dîhar dikin nava çivakê. Pirañiya zanayên zargotina kurda saya zêna xwe ya tûj ji çivakê hîn dibin. Wek ewana divêjin, bese carekê bibihên, wekî roja dinê eyn mîna gotina dastanbêjê

duh biwekilînin. Ne hemû merivên xudîyê zên, bi taybetî yên jîyanêda nû bişkivî, tirûş dikin zanîna xwe ber civatê raxin, vekin. Ewana his û zanîna xwe ji xwera, di malbata xweda, di carçova heval, hogir û merivên xwe yên nêzîk vedikin. Gele cara sedema vê girtî mayînê dengê wane "ne pir hêjaye" (wek xwexwe dibînin), ku newêrin ber civatê eyan kin. Bêşikê, ku guhdarvan hewceyî dengê xweş û şîrine. Ji mera, berevkirên zargotinêra, hilbet, giring bûye baş zanîna dastan û beyta. Bi vê amadebûnê mera lev hatye, gele şaxên nû û hêja peydakin, binivîsin. Ser van gotina hêjaye em bi kurtî ser navê dastanbêjê bi şuret Îskender (Hovhannêsyen Hovsêp') bisekinin.

Hovsêp' nava gel, nava meriyên derdora xwe bi navê Îskender dihat naskirin. Îskender cara pêşin li Yêrêvanê rastî me hatye, dema ji gund hatibû bajêr, wekî di radyoya kurdîda dengê xwe bide. Hatibû dengê xwe bide, ji ber ku nas û xizmê wî jêra gotibûn, awqas strana zanî, çima tu jî naçî dengê xwe bidî radyoya kurdî. Îskender çend stranên xwe spartibû radyoyê. Rokê Cemîla Celîl, xûşka me, ku wê hênê di radyoyêda berpirsyara rêdakşyona stran û mûzîka kurdî bû, Îskender ji radyoyê bi mêvanî anî mala me. Gava ji nêzîkayê me bala xwe da ser wî wek kana zanîna zargotina kurda, ji wir dostanya me ya salane dûr û dirêj despê bû û me dest bi jê nivîsandina stran û dastanan kirin.

Bi eslê xwe Îskender ermeniyê Turkyae bû, salên 20-î malbata wana ji nava êla reşkota bar kiribû hatibû Sûryae, ji wir jî sala 1966-a neferê mala xweva koç kiribû hatibû Ermenistanê. Bi gotina Îskender, wî stranên xwe ji dengbêj Emerê Mûsikê Teto û ji cimetê hîn bûye. Dema me jê xwest çend strana ji mera bêje, daxwaza me dilxazî pejirand û go: "Raste dengê min pir baş nîne, lê ez gela strana û dastana zanim. Tiştê ez zanim raste û ji dengbêjên naskirî min girtye". Di navbera salên dirêj em gele cara çûne gundê wî Şêxlerê, ew hatye mala me û me jê stran û dastan nivîsîne. Distira û stranê wî qet xilas nedibûn.

Mînaekeke dinê ew Stranbêj Tehsînê Pasûriye, ku me di sedsalya XXI-êda nasîya xwe li Amedê daye hev. Ewî merivekî nerm, dostekî xêrxwaz û nirxdarê zargotina kurdane. Stran gele zanibû, lê ji ber dengê xwe xwe dîyar nekiribû nava dengbêjên Dîyarbekirê. Zanîna wî stranên kurdî rastî hêjayî bîranînyê.

Dengbêjên benda duda gêografya serenserî Kurdistanê hema-hema nav xwe digrin. Dengbêjê me ji herêma Efrînê (Çiyayê kurmanç) bûn, ku wek adeke kurdbûnê serbixwe ne dûrî Helebê, dora 366 gundên kurmançiyê di nav aqara xweda dicivand. Dastanbêjên me: Şêx Adîyê Hesnecarî, Nasirê Şemê, Cemîl Horo, Ebdul Qadir Hesên Nazi bûn. Kurdên herêma Efrînê bi hurmet û şêkirdarî ser van dengbêjan digotin û heta naka jî navê wana bi kêfxweşî bîr tinin. Dengên wana mala her kurmançekî Efrînê heye û tim guhê xwe didine ser stranên wana.

Ji Cizîrê (Sûrya) bûn dengbêj Silo Koro, dastanbêj Rifatê Darî. Silo Koro dinya gewrik heta du-sê salya xweda dîtye. Paşê temamya Kurdistanê bi gêografya xwe, ziman û zargotina zengîn bi çavên dilê xwe dîtye, hizkirye, parastye û ser bengî bûye. Rifatê Darî stranbêj nîbû dastanbêj bû. Bi pêşeka xwe şofir, şofirê ereba

barbir, li şîrîketa Romêlanê kar dikir, bavê yanzde zarokan bû û sî dastanî zêdetir ezber zanibû. Camêrekî ser xwe, beşerxweş bû. Dema li sala 1982-a me hev nas kir, temenê wî ji kalbûnê gelekî dûr bû, lê îdî gîhandibû hemû zanîna xwe bi kasêta bela ke. Bi kêfxweşî ji mera destanên xwe stra û me jê nivîsîn.

Dema Sovêt ket, derfet ji mera çê bû em rêwîtiya Kurdîstana Turkeyayê, Îraqê jî bikin û li herêmên kurda zargotin binivîsîn. Ji bona me nirxdar bûne seredanên Hekkarîyê, Amedê (li Turkeyayê), Dihokê, Zaxoê (li herêma Kurdîstanê – Behdînanê, li Îraqê) û herêmên mayîn. Li Dihokê me ji Îsmailê Ewdîşo Yoxann Mergeyî, ku bi eslê xwe asûrî bû, Fehmî Ebdulla Xelîl Bilaweyî; li Amedê (Diyarbakirê, Turkeya) ji Dewrêş Hecî Şêxmûs, Tehsînê Pasûrî û yên mayîn beyt û dastanên balkêş nivîsîne. Li Ermenîstanê û Gurcîstanê (Komarên Yeketya Sovêtê li Kavkasyaê) dastan û beytên, ku me nivîsîne, pîrhijmarin. Ji mera girîng bûne dastan û beytên ku Et'arê Şero, E'gîtê T'êcir, Morofê Meh'mûd, Feremezê Ezdo gotine. Gotina dengbêjên ji Kavkasyaê şaxên dastan û beytan dewlemend kirine.

Hêjayî gotinêye, wekî stranbêj û dastanbêjên gele berheman bi eslê xwe ermenî bûne, yên ji Turkeyayê-Sûryaê hatibûn Ermenîstanê. Pîranîya wana gava hatine Ermenîstanê qet ermenî jî nizanbûne, yan pîr qels zanibûne, lê taybetîya wana bû, wek ewana bi jîyana li Kurdîstanê, di welatê nûda jî wan evîndarê zargotîna kurda bûn bi zanebûna xwe ya stran û dastana, di gundên xweda bi hunermendîya xwe bûn gula civatê. Hovhannêşyan Karapêt, Îsê Vartê, Aslanyan Movsês, Sîmonyanyan Hovsêp', Sincoyan Manûk, Aslanyan Pêtros û yên mayîn. Zarbêj ji temaenê 25-30 salî heta hevtê heystê salî bûne. Di rêza beytbêjada kulfet jî hebûye. Mînak, pîr Kida Ūso, ku ji mera beyt û serhatîya gotîye.

### *Zargotin yan Folklor?*

Ji berhemên gelêrîye bi zar gotîra navlêkirinên folklor yan zargotin di tradîsyona kurdzanîyêda wek peyvên sînonîm, weke hev tên karîn. Folklor gotineke întêrnasîonale, zargotin bi kurdîye.

Peyva zargotin ser bîngê û bandura zanistîya salên 1930-1980-î li çarçova Yeketya Sovêtê wek peyv-têrmîna hemwatê gotina folklore-ê hatye karanîn. Peyva zargotin cara pêşin ji aliyê pisporê çand û edebiyeta kurdî Ordîxanê Celîl ji despêka salên 1960-î ketye nava zimanê zanistîya kurdî.

Di wan salanda li kurdzanîyê: dîroknaşî, zimanzanî, êtnologîya, edebiyetzanî (ya klasîk), folklorzanî û yên mayîn gulvedan. Di rêza van zanistîyanda, priorîtêta folklorzanîyê zêde û taybetî bû.

Ji roja rojda li Sovêtê mezin bûye baldariya dewletê û dezgehên zanistîyê ser çand û hunera gel. Ber xemxuriya dewletê bûn hemû millet û gelên Sovêtê, êtnîkgruppên Sovêtê, bê cudakirîna ziman, parastin, esil, reng û rû, pîrhijmarbûn û kêmhijmarbûna wan sûbêkta. Di zanistîya Sovêtêda ji hev hatin cudakirin têgihîştina zanistîyên êtnografîyê û folklorê. Her yek ji vana meydana xwe ya lêgerînê û bervedanê eşkere kir.

Peyva folklor li Rûsyaê berî rêvolyûsiya Oktyabirê ji zanyar û întêlêktûalanra

xerîb nîbûye. Li sedsalya XIX vê gotinê karanîne wek hevwatêya hemû zanîna ser gel, her çî ku gel ji goftûgûya berê girtye. Di vê gotinêda têgihîştine: çîrok, lêgênd, evsûn, stran, têderxistinok, hilbestên zaroka, edetên dewatê û şînê, gotinên pêşîyan, çîvanok û hw.<sup>19</sup>

Li Yêvropayê di zanyariyêda peyva folklor kar anîne û kar tînin bi mana stran û dîlanên gelêrî.<sup>20</sup>

Paşwextyê li Sovêtê wek sînonîma peyva folklor-ê kar anîne usa jî navlêkirina: "berhemdarya gelêrî ya bi zar gotî". Hên zêde, pêra jî ji hev bişkavtine du grûp: berhemên gotinên gelêrîye pexşanî û berhemên gotinên gelêrîye poêtîk, hilbestkî.

Peyva *zargotin* di kurdzanîya îroyîda cîyê xwe dewsa *folklorê* digre.

Kîjane çarçova zanistîya, ku em jêra wek folklor yan zargotin nav lê dikin?

Bona van herdu peyva bingehîne watedayîna çanda gelêrî. Pey vê gotinê *divê* em destnîşan kin, ku pişt vê sekinîye dinyake pirreng, taybetî û zengîn.

Her çend jî raste, wekî zargotin bingeha xweva bi axaftinêva, çêrkinêva girêdayîye, lê dîsa ew parçekî gilover û bê dest û pê nîne. Tu nikarî stranên zargotî, ku rêberya hilbesta dikin, yan jî bi dîlanan têne qetandin, ji trdîsyonên, ku bi hezaran salan rabûn-rûniştina gelva hûnandî bûne, ji hev cuda kî stranên ritûal, yên dewata, yên şîna, ku bi xwe dighîjine zanistya êtnologîyê, bi hev girênedî.

Zargotinzanî zanistîke pevgerêdana zanistiyane. Bi zargotinzanîyêva hemparînin him êtnologîya û hem filologîya.

\*\*\*

Şertên çapkirina dastanan li benda duda her ewin, çî ku me danîne di bîngeha çapkirina benda pêşînda :

a/ biparêzin taybetmendîya ziman, axaftina zarbêj. Heger zarbêj peyvek bi du şêweyî kar anîye (wek: *dibê, divê*) me neguhastye, hiştaye wek gotye.

b/ Ji ber ku zimanê zarbêj li hine herêmên Kurdistanê dîhar dike prosessa (meşa) axaftina derdora xwe ya çewt, tevlihevkirina îşaretkirina cinsiyata mê û nê, me gotinên zarbêj rast nekirine, bi wê armancê, ku bala lêkolîner, zimanzan û xwendkar zêde bikşînin ser xaraktêra çewtîyê.

c/Amadekarên Zargotina kurda ya pîrbendî alfaba Celadêt Bedirxane ser tîpên latînî ji xwera bingeh girtine, bi serda zêdekirina vêrgula alîkar ser fonêmên: ph; kh; ch; th; e'; h', rr û yê mayîn, bi wî armancî, wekî devokên kurdî, bi axaftina her zarbêjî û herêmî bêguhastin û rast bê xuyakirin.

19 Лесевич В. Фольклор и его изучение. Лит. сб. Состоит из трудов русских литераторов. М. 1899, с. 343.

20 Ferhenga mezin ya zimanê almanî *Duden*, peyva *folklor* ha mak dike: "Ji peyvên înglîsî: *folk* û *lorê*, bi mana qal, beskirinê tê." Û du watê dide: 1. Dengê gelêrîya qalkirî *Überlieferung*, wek stran, cîl û berg, edet. 2. Zanistîya ser gel: mûzîka gelêrî, dîlanên gelêrî û hw.

## Alfaba karani

A, a	G, g	N, n,	T', t' [Th, th]
B, b	H, h	O, o	U, u
C, c	H', h'	P, p	Û, û
Ç, ç [Çh, çh]	I, i	P', p' [Ph, ph]	V, v
Ç', ç' [Tch, tch]	Î, î	Q, q	W, w
D, d	J, j	R, r	X, x
E, e	K, k	R', r' [Rr, rr]	Û, ù
Ê, ê	K', k' [Kh, kh]	S, s	Y, y
E', e'	L, l	Ş, ş [Sh, sh]	Z, z
F, f	M, m	T, t	

---